# Li ser çavan digel şêwirmendên xizm û eqrebeyan têkiliyê deyne.

**Ji bo te ku temenê te li jêr 65 salan be**
**Telefon:** 031-365 50 30
**E-post:**
anhorigstod.under.65@funktionsstod.goteborg.se

**Ji bo te ku lênêrîna kesekî temenê xwe li jêr 65 salan be dikî**
**Telefon:** 031-365 00 00, Göteborgs Stads Kontaktcenter. Pirsa şêwirmendên xizm û eqrebeyan li herêma xwe an jî li herêna kesê tu lêdinêrî bike.

**Tu yê zêdetir agahdarî li malpera**
goteborg.se/anhorigstodnaradig bibînî an jî koda QR bi kar bîne.

**Pêywendiya min**

______________________________

______________________________

______________________________

Göteborgs Stad HOF Utskriftsversion webb December 2025



Göteborgs Stad

# Ma tu piştgiriya hîn kesan dikî?

## Hîngê ji bo te piştgiriya ji bo xizm û eqrebeyan heye!

**Informationen finns även på finska och flera andra språk**
goteborg.se/anhorigstodnaradig

# Ma tu piştgirî, alîkarî an jî lênêrîna hîn kesên nêzika xwe dikî?

Ma di malê de hîn kesên nêz, kalûpîr an cîwan hene ku tu piştgiriya wan bikî ku nexweş bin, pabendî maddeyên heşbir bin an jî astengdariya fîzîkî an derûnî pê re hebin û pêdiviya wan bi te hebe? Ew kesê nêz dikare endamê malbatê, xizm cîran an jî dostekî nêz be. Weke kesekî nêz tu gelek girîng î û karê tu dikî jî gelek pêwîste lewra hîn cîran jî pêdiviya te bi xwe heye ji bo piştgiriyê.

**Bergeha xizm û eqrebeyan**

Ji bo ew xizm û eqrebe ku dixwazin piştgirî, alîkarî û lênêrînê didine kesên nêz gelek cûreyên destekê tên dayîn. Ew berlêgirtin li gorî pêdiviyên xizm û eqrebeyan tê dayîn da ku jiyana rojane bi rengê fîzîkî, derûnî û cîvakî hesantir bike. Li gorî armanca xebata ew dikin û koma hedefkirî dê ew xizm û eqrebe bên pejirandin, rêz ji wan re bê girtin û ewê weke deramet û derfet bên li ber çavan girtin.

**Karê me wê li gor çerçewa qanûna xizmetguzariya cîvakî beşa 13 û benda 9:**

*”... be û ew kar dê piştgirî pêşkeş bike ji bo wan kesên ku xizm û eqrebe ne û alîkariyê didin kesên salmezin, nexweşên demên dirêj an jî xizmeta kesên astengdar dikin.”*

# Ma tu dixwazî di derbarî halê xwe de bi hîn kesan re biaxifî?

Li şaredaroya Göteborg şêwirmendên xizm û eqrebeyan hene ku ji bo alîkariya xizm û eqrebeyan kar dikin weke axaftin, semîneran, perwerde, avakirina komên xizm û eqrebeyan an jî hîn caran ji bo tu pêş xwe bibînî.

Him tu weke xizm û eqrebe û her wiha kesê tu lêdinêrî mafdar in ku li ba sekreterê karûbarên xizmeta civakî li ser navê xwe serî lêbidin da ku vê alîkariyê bistînin. Ew reng alîkarî dikare weke nobeguhertina li malê be, karûbarên rojane be an jî ji bo armanceke din be. Ger te pêwîstî bi werger hebe emê alîkariya te bikin da ku werger bê peyda kirin.

